

## Bêhêviya Narînê

**Di** komcivînekê de, berpîrsiyek ji tevgera me, dest bi axaftan xwe dike. Li ser rewşa welêt û bi taybetî ya tevgera Kurd li Sûriyê radiweste. Şerekî tûj û bi kîn ji hin basikên tevgerê re dike... û li dawiyê xwe tenê dibîne.

Beşdar dest bi pîrs û gotinên xwe dikan. Berpîrsiyar bersivên beşdaran dide. Di quncikekê de, keçeke çeleng, di hundrê xwe de dikele, keserên kûr dikşîne. Li dawiyê destûr dixwaze û bi dengê şîn dibêje:

Ev demeke dirêje ku, ez li komjvînan beşar nabim. Ji ber gava ez berpîrsiyekê tevgerê dibînim, her dere bêhêvîyên min mezintir dimin. Xuyaye, evqas guhartinên li seranserê cîhanê, -ji hilwaşndina Sovyêta berê, dîwarê Berlîn, Hevbenda Warso û şoreşa teklolojî- bûne, haya tevgera me jê nîne. Hîn bi mêjiyê êl û eşîran mijûl dibin. Ev gotinên maosteyê hêja yên li ser hin basikên tevgerê , gotina pîrejina hişmend, Henîfa Oskê atîne bîra min. (*Ji herêma , herêma me, ji herêma me, gundê me, ji gundê me, mala me û ji mala me ez*).

Eger em li porgiramên basikên

**Hesenê Cumî**  
tevgera me ya Kurd li Sûriyê vegerin, emê bêguman van tiştên hevpar û sereke bibînin.

- 1- Hebûna milletê Kurd li Sûriyê, yê li ser axa xwe ya dîrokî .
- 2- Du pirojeyên kirêt û ne mirovane, yên ji hêla destlata Sûriyê ve, li ser Kurdan hatine ajotin, ew jî KEMBERA earbî û SERJIMARA awerte ne.
- 3- Çareserkirina pîrsa Kurd li Şamê ye.
- 4- Bi destxistana mafên netewî, di çarçewa Sûriyê de.
- 5- Şêyewyên kar û xebata tevgerê, yên aştiyane û demokrat in.

Gelo: Ev xalên jorîn yên me jimartine, ne bes in ku, basikên tevgera me di bin siya wê de bicivin û lihevbin!?. Basikeke ji tevgerê, çiqas mezin an bi çûk be, bi tena xwe kane çibike!?. Hejmara endamên wê, yên li civatan beşdardibin li gorî gelê Kurd li Sûriyê çiqas in!?.

Hêviya min ew e ku, rojekê ji rojan , ez bibînim ku, berpîrsiyarek ji tevgera me, di komcivînekê de li ser kêmkasiyên partiya xwe bisekine û rexnên beşdaran bipejrine.

*Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê  
Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de*